# MOA Û PELLE

## Çîrokeke evînî



Kerstîn Johansson i Backe

# Moa û Pelle

# Moa û Pelle

Çîrokeke evînî

Kerstin Johansson i Backe

Wêne: Inger Edfeldt

Wergera ji swêdî: **Serkan Birûsk**

NÛDEM

Weşanên Nûdemê: 53
Moa û Pelle
Çapa yekem: Stockholm: 2000

© Kurdiya wê: Weşanên Nûdemê
Pergala bergê û rûpelan: Nûdem
Wêneya bergê: Inger Edfeldt
Wergera ji swêdî: Serkan Birûsk
Navê orjînal: Moa och Pelle
Çap: Nina Tryckeri

ISBN: 91 88592-53 7

Navnîşan: Nûdem: Box 177, 177 23 Järfälla

E-mail: nudem@telia.com
Tel û faks: 08-58013162 / 08-58356468


Hîna ji hatina otobusa dibistanê re wext mabû. Dîsa jî, Moa û Pelle rûniştin û li bende man. Wan dixwestin êmin bibin ku otobus bê wan neçûye. Bi rastî jî, ji bo wan rojek girîng bû. Rojek ku ew ê tucarî jibîra nekin û ê timî di bîra wan de bimîne.

Ew li ser vê rojê fikirîbûn û peyivîbûn. Ew roja ku ew ê dest bi dibistana bi rastî bikin. Carnan wan bêrî dikirin. Carnan jî, ew ditirsiyan.

Dema ku Pelle li gotinên bavê xwe guhdarî nedikir, bavê wî digot:" Tu bisekine heta tu dest bi dibistanê bikî! Li wir tu ê baş fêr bibî!" Û Moa, ew li hemû zarokan difikirî. Ew ya ku wisa şermok bû. Lê Pelle bi wê re bû. Vê rewşê hesteke xweş û ewle dida wê. Ew roja ku wan ê bi hevdû re pifî çardeh findên li ser pasteyê bikira, hate bîra Pelle. Ew çiqasî keniya bûn. Pişt re ew bi hev re ketibûn binê nêrdewanan û li ser mezinbûna xwe peyivîbûn.

Bi rastî jî tijekirina heftsaliyê gelekî girîng bû. Mirov şeş salên xwe tije dike û dibe heft salî. Wek ku tu qevzekê bi jor de hilkişî. Û pêpelokek din jî.

Du çiftlik li teniştа hev li Lîllonê hebûn. Li yekê malbata Moa dima û li ya din jî, Pella tevlî dayik û bavê xwe lê diman. Ev herdû zarok timî bi hevdû re bûn. Ew bi hevdû re li ser heman girikê qumê rûdiştin û bi hevdû re jî qum dikolan. Bi hevdû re dipijandin û dixwarin û radizan. Bi roj ew kêlîkekê jî, ji hevdû nediqetiyan.



Moa gelekî hej ji xewa serê sibehan dikir. Ew timî di xewê de dima. Pelle sibehan zû ji xew radibû. Ji roja ku dihate bîra wan, Pelle timî diçû ber mala Moa û li benda wê dima heta ku ew şiyar dibû. Ew diçû wî serî û dihate vî serî, diçû wî serî û dihate vî serî. Dayika Moa, ku navê wê Birgit

bû, pencere vedikir û dixwest, ku Pelle were hundir, lê wî nedixwest. Heta ku Moa diçû û xwe di pencereyê re bi rûyê xwe yê sor û çavlixew nîşan dida. Wê kincên xwe li xwe dikirin, taştêya xwe dixwar û hêdî hêdî derdiket devê derî bi awayekî şiyar.

Roja wan ha wisa dest pê dikir.

Dayikên Pelle û Moa diviyabû di vê roja pêşî ya dibistanê de li vir li qiraxa rê bûna û di ber zarokên xwe re heta dibistanê çûbûna, lê tiştin qewimîbûn. Dayika Moa berî bi hefteyekê piyê xwe şikenandibû. Ew niha li ser kursiyeke medbexê rûniştibû û çîmê wê yê celskirî radayîbû. Mirov nikarîbû bi vî çîmê han xwe bigihanda gundê Storbynê. Lê dayika Pelle gotibû:" Ez ê bi zarokan re herim, tu xeman mexwe!". Lê bifikire bê çiqasî nexweş e. Rojek berî ku dibistan dest pê bike, yek ji çêlekan çûbû nexweş ketibû û li tewleyê li erdê dirêj mabû. Diviyabû dayika Pelle li malê li

bende Beytar mabûya, ji ber ku bavê Pelle diviyabû çûbûya êzingan.

Herdû zarok ji ber ku dayikên wan dê li gel wan neçûbûna dibistanê aciz nebûbûn. Hema bêje bi dilê Pelle bû. Dayika wî gelekî baldikişand ser xwe. Ew bi dengê bilind dipeyivî û dikeniya. Li malê ne xem bû. Heta hinekî xweş jî bû. Lê li bajêr. Pelle gelek dayikên din jî li bajarê Storbynê dîtibûn. Ew zêde wisa ecêb xuya nedikirin. Pelle zanîbû ku ev şerm e, lê dîsa jî, carnan ji ber dayika xwe fedî dikir. Diviyabû ev ne li vê daîreya xweş pêk hatibûya. Dayika wî wilo bi dengekî bilind henek kiribû û keniyabû, ku hemû kesên li wir keniyabûn. Wek ku pîrekên din yên Storbynê naziktir bûn. Bi hemû aliyên xwe naziktir bûn, bi çavên xwe û bi dengên xwe.

Pelle kincên nû kirîbûn. Kondê wî yê hişk hinekî laşê wî dişidand, lê ew gelekî kêfxweş bû ku dayika wî ew kincên fireh û mezin ji wî re nekirîbûn. Kond diviyabû teng bûya. Her çiqasî mirov li

gundekî ku ji du malan pêk dihat dima jî, dîsa jî mirov zanîbû bê wê Kond çawa be. Kondê Moa jî hebû. Eynî mîna yê Pelle bû.

Moa ji zû de xwe fêrî xwendinê kiribû. Pelle difikirî, ka ew ê fêrbûna xwendinê zehmet be. Moa xwe qure dikir, ji ber ku wê, ji wan xêze-xemlên biçûk fêm dikir. Moayê digot ku ev dê bibin çîrok. Lê Moa dê bi xwe bixwenda, ger li ber Pelle fêrbikirana, dê wî jî karîbûya bixwenda.

– Wek ku êdî payiz e, Moa gotibû.

– Çawa? Pelle pirsîbû. Ew difikirî ku havîn e.

Wê demê Moa ew kulîlkên li keviya kaşik nîşanî Pelle dabû. Çawa ku êdî ew blîlila klockorna nema blîlila bûn, kulîlk jî yeker çilmisî bûn.

Pelle fikirîbû: Çawa Moa dikare tiştên wisa bibîne, ji ber ku ew gelekî biaqil e, ji ber vê jî gelekî kêfa min ji wê re tê. Dema ew carnan bi şev li wê difikirî, xwe hêdî dixist binê lihêfê, wê demê xwe bi xwe wêrîbû vê gotina rast bibêje: EVÎN. Ji ber ku ew gelekî şêrîn bû. Û ji ber ku wê wisa xweşik

dinerî. Ji ber ku ew wisa bedew û narîn bû. Û ji ber ku Moa wisa henûn bû.

Ew ê tu carî Pelle li xwe dananiya ku a dilê xwe ji wê re bigota. Wê ev zanîbû bê ku mirov peyvên şaşomaşo jî kiribûya. Yên mezin, bawer dikin ku divê mirov di ser çardehan re be heta ku mirov karibe evîndar bibe. Lê Moa û Pelle herdûyan jî çêtir zanîbûn.

Niha otobusa dibistanê hatibû. Ew kesk bû û ew nêzîk bûbû û hey nêzûk bûbû û zarokan lewhe dîtibûn. Dawiya dawî ev roj hatibû, Pelle fikiribû. Niha êdî mirov nema zarok e. Niha em diçin vê dibistana rastî. Wî bi destê Moa girtibû û ew li qiraxa rê şipê rawestiyabûn.

Pelle gelek carên din şofêr dîtibû. Ew hema hema difikirî ku ew wî nas dike. Navê wî Axel bû û ew apekî gelekî devliken bû. Mirovekî wisa bû ku timî henek dikirin. Axel hemû gundiyên li vê herêmê baş nas dikirin, û ew bû yên ku hemû lazimiyên malbatên ku li dûrî Storbynê diman pêk di-

anî. Derman ji gundiyan ji dermanxaneyê dikirî. Ji dikanan jî lazimiyên gundiyan yên wekî din tedarik dikir.

Di dema ku Moa û Pelle bi otobusê ve hildikişiyan Axel bi wan re bişirîbû. Ew li zarokên din zîvirîbû û gotibû:

– Hûn dibînin ciwanino, ev beşek e ku zû dest pê dike. Van herdûyan, ji zû ve ye ku hertişt bi hevdû re eyar kirine.

Hemû zarokên di otobosa dibistanê de keniyabûn. Pelle û Moa tenê devên mezin yên dikeniyan dîtibûn.

– Hay ji xwe hebe, Pelle! qîriyabûn hinekên ku devên wan ji kenan heta bi pişta guhên wan çûbûn.

Pelle destê Moa bi xar berdabû. Zaroktî ye ku mirov wiha bike, bi acizbûn fikirî. Ma mirov wiha bike, ji bo ku zarokên din bi mirov bikenin.

Ji bo Moa ev roja pêşî ya li dibistanê wek ku ew di nava teqana herî de bimeşe bû. Herîyeke wisa

ku mirovan hilnagire. Lê dîsa jî, hinek tûmikên hişk ku mirov xwe karîbû li ser wan girtibûya hebûn û dûv re yeka din dihat. Moa timî xwe wisa hîs kiribû.

Tûmika pêşî ya ku ewle xuya dikir, ew dem bû ku mamosta bi navê Sonja Persson ji baxçeyê dibistanê hatibû û bi destê wê girtibû û gotibû;

– Ez dizanim navê te Moa ye û tu ji gundê Lillînê hatiyî. Ger tu dixwazî tu dikarî digel min werî hundirû.

Ew ê pir baştir ba ku Sonjayê Pelle jî, digel wan bianiya, Moa fikirîbû. Lê ew ji zû de bû ku ew bazdabû cem çend kurikên din.

Ew dema ku mamosteya wê hatibû derve û bi destê wê girtibû û jê re gotibû ku ew dikare bi wê re were hundir, wê axa di binê nigên xwe de hişktir hîskiribû.

– Diya te telefon da, bi mamosteyê re peyivî. Ew dixwaze ez binerim bê tu baş î.

Bi Moayê mamosteya wê ji hemû jinên ku wê

heta ditibûn xweşiktir bû. Bihara derbasbûyî hate bîra wê. Disa eynî mamoste bû. Niha mamosteya wê eynî mîna wê demê rind bû. Lê niha kincên wê ne şîn bûn, li şûna wê niha kesk in. Û niha gerdeneke pir xweşik di stûyê wê de bû. Gerdena wê ji mirariyên şînekeskên biroqanî yên avzêrîn hatibû çêkirin. Ew mîna roja li ber ava xuya dikir.

Dibistan kevn, bilind û mezin bû. Lê tevî ku ew kevn jî bû, bêhna reng û boyaxa nû jê difûriya. Li wir bêhna zemqê ya sotaktiga hatibû.

Saeta pêşî hemû zarokan behsa xwe kiribûn, navê xwe gotibûn. Navên wan yên pir xweş hebûn. Navên wan Kristina, Magnus, Susanna û Camilla bûn. Lê Moa tenê navê wê Moa bû.

– Moa Karlsson, wê got.

– Dengê xwe bilind bike, mamoste got.

– Moa Karlsson, Moa bi dengekî nizmtir got.

– Wa, mamostê got. Moa Karlsson.

Herkes li xwe zîvirîbû û temaşe kiribûn. Lê dema ku dor hate Pelle, wê demê wî navê xwe ne-

got.

– Pär, wî got . Päär Andre.

Ecêb zêde dayik li wir hebûn. Lê ew nerûniştî bûn. Ew li ber dîwêr şipiya bûn. Tenê du bav li wir hebûn. Mezin giş dikeniyan. Mîna ku ew li tiştine gelekî bi kêf temaşe dikin, xuya dikirin. Wek ku hemû şagirt çêlîkên pisîkan bin. Wan mamoste mîna şivanekî ku şivantiya van çêlîkê pisîkan dike didîtin.

Li vir hundirê sefê bi rastî jî wisa talûke xuya nake, fikirî Moa. Li ser vê texteya reşeşîn mamosteyê bi tîpên xwar yên mezin HÛN BI XÊR BÊN nivîsîbû û dora nivîsa xwe jî, bi gulên xweşik î biçûk xemilandibû.

Vir jî mîna tûmikekî biçûk xuya dikir, platformeke biçûk, li wir mirov ji strangotinê neditirsiya. Derve, baxçeyê dibistanê bû ku mirov ditirsand. Hîna jî ser dilê Moayê dişewitî. Ew kenê li otobusê wek ku dilê wê gezkiribû û pê ve asê mabû. Dibe ku dê hemû demên li dibistanê wiha bin. Dê ne


mîna ku Moa fikirî bûya. Wê xeyal kiribû bê wê çi xweş be. Bêrîkirin û tirs herdu jî bi wê re hebûn. Lê helî zêde bêrîkirin. Wê çawa bûya dema ku Moayê ji xwe re keçikek ku bi wê re bileyize dîtibûya. Tucarî hevaleke wê çênebûye. Keçikek eyn mîna wê bi xwe. Tenê hevalê wê Pelle bû. Timî fikirîbû ku ew ê wî ji xwe re bihêle. Dema ku ew mezinbûbûna ê ewê bi hev re bizewicîna û ê zarokên wan çêbûna û tiştên wisa. Û wê wan zarokek çêkira û wan li hevdû kiribûn ku ew ê keç be.

Heta îro jî ev wisa bû.

Li malê ew li ser şermoktiya wê peyivîbûn. Bavo gotibû, gelekî baş e, ku ew derketiye derve nava xelkê. Ev gelekî baş e, ku ew dê dest bi dibistanê bike, wî gotibû. Wê demê ê şermokiya wê here. Lê berevacî bû. Moa ev hîs dikir. Ev der gelekî xerabtir bû. Tenê rûyên nenas hebûn. Wê gelekî bêrîya odeya xwe kiribû, bêriya quncika ku tê de dileyist jî kiribû. Wê bêriya malê û dayika xwe kiri-

bû. Wê bêriya rojên xwe yên normal kiribû, bêriya leyistina bi Pelle re jî kiribû, rûniştina li ser çokên bavo û bi dayika xwe re li medbexê bûyin.

Zengilê dibistanê lêdabû. Dengekî tûj. Hemû di derî re derketibûn. Mamoste û zarok û malbat. Lê Moa li ciyê xwe mabû. Wê li vê sefa mezin ya çargoşe ku lê mobilyayên normal tunebûn xwe bi ewle hîs kiribû.



Tenê bankên biçûk, kursî û pencereyên bilin û hey bilind hebûn.

Lê di wê demê de mamoste bi paş de hatibû, derî nîvcî kiribû û gotibû:

– Wîî Moa, tu çima li vir wisa tenê rûniştîyî? Ma tu jî narî derve û hewayeke paqij nastînî ?

Ev mezin, timî behsa hewayê dikin, Moa fikirî. Dayika Moa û ya Pelle jî wisa dibêjin. Dema ew dixwazin tenê bimînin. Ji ber, ku ew ê li ser tiştên wisa bipeyivin, ku ew difikirin, zarok bila ji wan fêm nekin. Ev mezin carnan dibin mîna zarokan. Ew difikirin, ku zarok tucarî tiştekî fêm nakin.

Çakêt li poxanê (korîdorê) daliqandî bû. Çakêtê wê bi tenê xuya dikir, dema ku ewqase çengelên vala hebin û tenê çakêtek daliqandî be. Heta ji Moa dihat bi giranî tevdigeriya. Lê mamosteya wê li bende bû û çavên xwe jî ji ser wê ranedikirin. Ji ber vê yekê jî, Moa tenê diviya bû, fermûara çakêtê xwe bikişanda jor û derketa nava zarokên li derve.

Hemû zarokan bi kêf xuya dikirin. Tenê yek jî, ji nava wan mîna wê wisa aciz xuya nedikir. Li her deverê rûyên nenas hebûn. Ji bilî yekî. Wê Pelle dîtibû. Lê dema ku wê xwe li Pelle girtibû û hetibû cem wî, wî bi acizî gotibû:

– Here ji cem min!

Moa gavekê bi paş de çûbû. Wê çend keçikên ji sefa xwe dîtibûn, û wan dîtibû bê Pelle çawa berdabû wê. Çavên hemûyan beloq bûbûn. Moayê nema zanîbû bê wê bi ku de here. Tenê rûyên nenas li dora wê hebûn. Rûyên biyanî. Zarok yên ku pir qenc û milahîm xuya dikirin, lê dîsa jî, Moa ji wan ditirsiya. Hinek ji wan mîna Moayê girs û xişin bûn, lê yên ji wê girstir jî hebûn. Yên ku diçûn sefa pêncan, û yên ku wextî şeş biqedandana. Û mamoste hebû li derve...

Moayê xwe ji zarokan dizîbû. Ew ji xwe re li cîhekî ku lê zarok tunebû geriyabû. Carnan ew berepaş çûbû. Hêdî hêdî ew nêzîkî deriyê baxçê dibistanê bûbû. Wê nedixwest ew li devereke ku ew

nasnake bimîne. Wê baş nizanîbû bê ew ê bi ku de here û bide ser kîjan rê. Çiqasî ew li deriyê hewşê yê şîşkirî nêzîk bûbû, wê ewqasî lez kiribû. Dema wê derî li pişt xwe hiştibû, ew bi bazdan ji wir dûrketibû. Wê qet nizanîbû bê ew ê bi kîjan riyê de here.

Hemû zarok bi lez hetibûn sefê, di wê demê de Pelle ferq kiribû ku Mao reviyaye. Ew difikirî gelo ew bêje. Pelle yê ku difikirî, dê Moa pir hej ji dibistanê bike. Moa ya ku dikarîbû bixwenda û bi hertiştî zanîbû. Dîsa jî ew bû ya ku xwe xera kiribû.

Lê Mamosteyê jî ferq kiribû ku Mao ne li sefê ye.

– Moa li ku ye?

Ji bo ku ew dilê xwe têxe cî wê li kaxiza navan nerîbû.

– Ka Moa Karlsson li ku ye? mamosteyê gotibû.

Pelle sor bûbû. Eynen wek ku wî keçik jibîra kiribe.

– We tiştekî xerab li himberî Moayê nekiriye ne, ku ew pê aciz bûbe, bi pirsyarî gotibû.

– Naaa, hemû zarokan gotibûn. Wan wê aciz nekiribûn. Wan keçik tenê carekê jî nedîtibûn.

Pelle, fikirîbû: dibe ku min tiştekî xerab kiribe. Piçek dînîtî kiribe. Hate bîra wî dema ku wî bi acizî ji wê re gotibû:

"BIQEŞIDE". Lê wî ev negot.

Mamosteyê Pelle şandibû derve. Ew bû yê ku keçik nas dikir, ji ber vê jî, ew ê çûba li derûdorê li wê geriyaba. Dîsa jî, Pelle xwe sucdar didît. Ew bû yê ku bi wan keçikên din ku mîna dînan tevdigeriyan re peyivîbû. Pelle hîskiribû bê çawa hinarkên wî mîna agir sor û germ bûne.

Lê baxçeyê dibistanê vala bû. Wî Moaya çakêtsor û kondşîn nedîtibû. Li ser riya li pêşiya wî otomobîl derbas dibûn yek li pey yeka din. Wî xaltîk û metikên ku ji kirînê tevlî tûrikên xwe yên tije dihatin dîtibû.

Wî baş fêm kiribû ku Moa niha li ser rêya malê

ye. Ew baş têgeheştibû ku ew ê bi bazdanê nikaribe bigihêje Moayê.

Pelle bi qasî kêlîkekê li devê deriyê sefê rawestiyabû. Wî dizanîbû ku ew dikare bi awayekî alîkariya Moayê bike, lê wî nizanîbû bê ew ê çawa bike. Ew gelekî li ber Moayê diket. Bi wî re hîsa ku Moayê tenê û xemgîn daye ser wê riyê çêbûbû.

Pelle fêm nekiribû bê çima ew li ser wê psîka li malê fikirîbû ku tenê navê wê Pisîk bû. Havînê dayê ew bi bêhnçikyayî anîbû. Ev pisîkek bajarî guneh e, gotibû dayê. Pelle ne li bende bû, ji ber ku ev çêlîk bû. Çêlîkên pisîka bi mirovan re dileyizin û şêrîn in, lê eva han. Ev dişibe diya min ku bi pisîkek wiha hatibû. Pelle hîna jî nizanîbû ka ew hej ji vê dike, ji ber ku ev pisîk qet ne henûn e û ne jî bi mirovan re dileyize. Tenê dînîtiye. Hate bîra Pelle dema wî carekê xwestibû bi wê re bileyize, bê çi bûbû û çawa derbas bûbû. Wî ji piçûpariyên kaxizan gilokek çêkiribû û ew gindirandibû ber pozê wê. Pêşî wê xwe hêdîka qelizandibû

mîna ku ew ê bileyize, tam di dema ku Pelle fikirîbû ku ew ê xwe çem bike ser giloka kaxizan, pisîkê pişta xwe dabû gilokê û xwe di pişta dolabê de melisandibû. Li wir xwe serzik dirêjkiribû û ricifîbû û bi nerînên tirsonek temaşe kiribû. Ji wir deranîna pisîkê hema bêje pir zehmet bûbû. Pisîk hîna jî, ji herkesî ditirsiya ji bilî dayê. Moa jî eynî mîna pisîkê bêhiş û berrî bû. Wî nizanîbû bê ew dê çawa bike, ji Moayê jî. Di heman demê de ew bêtir aciz bûbû. Bazdana ji dibistanê. Li hindurê dibistanê wî gotibû: – ew ne xuya ye.

Mamosteyê awirên bêbawarî dîtibûn. Wan qasî kêliyekê li hevdû temaşe kiribûn. Lê mamosteyê bilez awirên xwe ji çavên wî deranîbûn û rabûbû ser xwe û bi xar ji sefê derketibû derve.

Gelo Moa bi kîjan riyê de çûbû. Niha hemû malbatên li dibistanê li ser vê meseleyê dipeyivîn.

– Reva ji dibistanê, divê mirov tucarî vê neke, keça binavê Camilla bi dengekî bilind gotibû.

Pelle fêm kiribû bê çiqasî tiştekî ne xweş bû, tiş-

tê ku Moayê kiribû. Gerek ew bi dû Moayê de çûbûya. Miheqeq ew niha li ser riya malê ye. Pelle diviyabû ew dîtibûya û ew anîba. Pê re jî ew aciz û hey aciz bûbû. Ji Moayê. Ji xwe. Ji Camilla û ji hemû zarokên din ku wisa bi coş û heyecan digotin ku divê mirov tucarî ji dibistanê baznede, mîna Moayê.

– Ev ne hêsan e, ku mirov biçûk be, mezinên ku li ber dîwêr rêz bûbûn gotibûn.

Pelle di çav, dev û hinarkên wan yên nepixî de dertanî bê ew çiqasî kêfxweş û razîne ji zarokên xwe yên ku ew fedîkar dernanîne.

Ji nişkê de mamoste li deriyê sefê xuyakiribû, careke din. Li pişt wê zilamek sekinî bû. Wê gazî Pelle kiribû û careke din wî xwe tewanbar hiskiribû.

– Bi raya min dê baş be ku tu bi xidame re herî, mamosteyê gotibû. Tenê, tu Moayê nas dikî. Ew niha li ser rêya malê ye û dema ew xidame tenê bibîne ew dikare bitirse. Tenê diviyabû ew rabûya

ser xwe û bida dû wî kesê ku mamosteyê jê re gotibû xidame. Ew li Volvoya wî ya kesk siwar bûbû. Pelle mîna ku aciz nebûbe hereket kiribû. Rêyek dirêj û rast li pêşiya Moayê bû. Ji zû de bû, ku wê dev ji bazdanê berdabû. Niha ew hêdî diçû. Ew fikirîbû: ez ê tucarî nerim malê. Heta ku çavên Moayê dîtibû tenê daristan û daristan bû. Dema ku wê bi çavên xwe li dûr dinerî, li jora çiyê rê mîna qaîşek zirav î biroqanî xuya dikir. Çam û ew rîşên rîha katan ku bi wan ve daleqiyayîbûn gewr bûbûn. Rîheke wisa pir xweşik bû, mirov dikarîbû xwe pê mîna pîrebokan bixemilanda. Pelle û wê bi wan rîşan simbêl ji xwe re çêdikirin. Ew bi wan simbêlan mîna kalan xuya dikirin. Sipîndarek û yeka din xuya kiribû. Sipîndar wisa xweşik û bi ronî xuya dikirin, li kêleka wan çamên tarî.

Û li erdê ew kevirên mozin xuya dikirin. Daristan wekî sêhrbûyî xuya dikir. Bifikire ku cin li wir hebin, wisa hizirî keçik. Ger cinek were wê. Mo



ayê baş zanîbû ku cin tunene. Tenê ew carinan bi şev difikirî, ku dikare cin hebin. Yan jî dema ku mirov pir di nava daristanê de here. Ha wê demê

mirov difikire ku cin hene.

Hilmeke kin berda. Bêdengî û xewletî li her aliyên wê hebûn û tirsê dixwest wê zeft bike. Carinan ew difikirî: Bifikire ku ez niha pêrgî xezeleke mezin bêm. Qet ew li hirçê nedifikirî, ji ber ku mirov pirr kêm, li van deran rastî hirçan dihat. Lê pezkovîyek. Û pezkovî mezin bûn.

Dema otomobîl li cem Moayê sekinîbû, wê baznedabû. Bi dilê wê jî bû, ku reva wê wiha biqediya. Dema deriyê erebeyê vebûbû, ew xweşik û bê mişkule li dawiya otomobîlê rûniştibû. Moayê dîtibû, ku Pelle di erebê de ye. Ew li pêşiyê rûniştîbû û rast li pêşiya xwe nerîbû. Moayê fêm kiribû, ku Pelle qeheriye. Tevahiya rojê ew wisa bû. Moa xwe bi xwe: Ji xwe Pelle ji zû de ye, nema guh dide min.

Wek ku hemû tiştên di nava sînga Moayê de mîna kevirên belek yên biçûk têne hêrandin bû. Wek ku ew Moaya ku kêfxweş û dikeniya şikestibe bû. Wek ku ew Moa ya ku hej ji Pelle dikir û ew timî

li pişt axur radimûsa nemabe. Wek ku ew Moa ya ku bi Pelle yê ku xwe dikir qiralê Çînê çûbe. Yan jî Moa ya ku dest di destê Pelle de, ji bo ku zanibin bê avzêm ji ku dizên li nava daristanê digeriya, êdî ew Moa ji zû de bû nemabû. Wê hîs dikir, bê ew kevirên hişk yên di nava wê de çawa hemû tiştên nerm û xweşik hûr dikirin. Û ew diêşiya dema hundirê wê dihate hêrandin.

Dema hêsirên wê destpêkiribûn bi ser destê wê de bariya bûn, wê germahiya hêsirên xwe hîs kiribû. Lê ev ne rast bû, Moa fikirîbû. Hemû tiştên di nava wê de cemidî û hişk û eceb bûn, lê dîsa jî hêsir gerim bûn.

Tevî ku Pelle li xwe nezîvirîbû, dîsa jî zanîbû ku hêsirên wê dibarin.

– De îca negirî, wî gotibû. Û wî ev bi qehr gotibû. Lê Moa nekarîbû pêşiya giriyê xwe girtibûya. Hêsir nuqutîbûn û hey nuqutîbûn.

Destmaleke şîn î çargoşe bi zîzikandin ketibû ser çokên Moayê. Wê li jor nerîbû. Wê di mirêka pêşî

ya otomobîlê de çavên xidamî dîtibûn. Moayê xwe tazî hîs kiribû. Wê xwestibû ku hêsirên wê nema bibarin. Lê ev destmala mezin pir baş bû.

Xidam destpêkiribû peyivîbû. Wî destpêkiribû behsa zarokên ku ji dibistanê direviyan kiribû.

– Tu divê nefikirî ku tu şagirta pêşî yî, ku ji dibistanê bazdaye, wî gotibû. Û tu ne ya dawî yî jî. Min gelek keçik û kurikên biçûk vegerandine. Tu dibînî ez ji zû de ye, fêr bûme. Destmala min amade ye. Baş e, ne? Ew yê ku difikire bazde divê pêşî ji xwe re destmaleke mezin peyda bike. Tu dibînî ne bê çiqasî rehet û nerm e, gotibû, di dema ku wê qermuçankên çavên xwe bi wê destmalê paqij dikirin.

Moa bêhemdî xwe bi xidamê dibistanê keniyabû. Peydakirina destmalekê. Tukes li vê yekê nafikire dema ku mirov li ser riya revê be.

Hêdî hêdî Moayê awirên wî di mirêka pêş ya otomobîlê de dîtibû. Meraqek piçekî xweş, ji bo baş têbigehêje bê bi rastî Moa yeka çawa ye.

– Hinek hene tenê ji bo revê çêbûne, zilam gotibû. Erê, dibe ku ez divê xwe bideme nasandin. Navê min Börje ye. Lê herkes ji min re dibêjin Bettet.

– Bettet? got Pelle û jibîra kiribû madê xwe tirş bike.

Xedame serê xwe hejandibû û bi lêva xwe ya xwar keniyabû.

– Wisa xuya ye, ku devê min hinekî xwar e, xidame gotibû. Xidame bikêf xuya kiribû.

Lê pê re jî xemgîniyekê xwe di çavên wî re dabûn der û Moayê ev dîtibû, di mirêka li pêş otomobîlê de.

– Keçika biçûk, wî destpêkiribû.

– Navê wê Moa ye, Pelle gotibû.

Xidame careke din, li Moayê meyizandibû û gotibû:

– Te bi xwe dikarîbû navê xwe hilda.

Moayê di çavên wî de gelek pirs dîtibûn. Moayê baş zanîbû ku ew divê vê bîstikê jibîra neke. De-

ma ku ew mezin bibe, ew dikare carinan li ser vê reva xwe ya pêşî bifikire. Wê xidameyê lêvxwar bê bîra wê. Ew ê ku bi wê daketibû û xwedî çavên bi mitale bû.

Demekê xidame yan jî Börje yan jî Bettet, yan jî em niha çi navî li wî bikin, werhasil ew bêhis rûniştibû. Lê careke din wî dest bi axaftinê kiribû. Û Moayê fêm kiribû ku ew tenê ji bo wê dipeyive, tevlî ku wî berê xwe dabû Pelle.

– Carekê min keçikek nas kiribû, wî gotibû.

Imm, em bêjin hivdeh salî yan jî bîst û sê salî hebû. Ew revvokeke wisa bû ku nayê gotin.

– Ew nediçû dibistanê ne? Pelle gotibû.

– Na, ew nediçû dibistanê. Lê ew keçeke ecêb revok bû.

Xidame keçik got, Moa fikirî.

– Ew keçik pir ji xwe ditirsiya. Hema dema ku wê di xwe de derdixist ku ew ne amade ye, wê bazdida. Yan jî ku ew difikirî, hinek ji wê aciz in. Û dîsa jî ew di nava wan yên ku hebûn de ya helî

bi aqil û bedew bû. Ji bilî wê herkes wisa difikirî. Heta ku min bihîst jî, ew wisa bû.

– Te ew digirt û dianî dema ew direviya?

– Belê, gelek caran. Hûn fêm dikin, gelekî dilê min bi ser wê keçikê ve bû, tevî ku ew yeka wisa revok jî bû.

Careka din jî Moayê çavên wî di mirêkê re dîtin. Niha çavên wî wek ku tije ken bin xuya dikirin.

– Bi raya min Moa eynî ew keçik e, xidame gotibû.

Moayê hilmeke kûr di pozê xwe re kişandibû ku pozê wê zirav bûbû. Ev xidamê ha jî mina hemû mezinan e, keçik fikirîbû. Ew timî mirov aciz dikin.

– Tu dizanî Pelle bê min çikir ji wê keçika ku hema direviya, xidame berdewam kiribû. Ez bi wê re zewicîm.

– Niha wê dev ji revê berda ye, pirsî Pelle.

– Erê, got Bettet. Ez bawer dikim.

Heta demekê jî kesî tiştek negot.

– Hûn dizanin kengî wê dev ji revê berda, piştî demekê gotibû Bettet. Belê, dema ku wê destpêkiribû hej ji xwe kiribû. Dema ku wê xwe bikêr dîtibû.

Ji zû de bû ku Moa nema giriyabû û ev çêtir bû. Dibistana sipî ya mezin ji zû de xuya kiribû. Dema ku Moa ji otomobîlê derdiket, wê ew destmala şîn ya şîl dirêjî Bettet kiribû.

Pelle û Moa dest di dest de neçûbûn hundirê sefê. Moa hinekî li pêşî diçû û Pelle bi dû wê de bû. Moayê xwe mîna heywanan hîs dikir. Mîna berxikeke biçûçik.

Mamoste ji Moayê ne aciz bû. Lê wê li ser Moayê gotibû û hey gotibû. Herçiqasî mamosteyê berê xwe dabû hemû zarokan û bi giştî axifîbû jî, lê Moayê zanîbû ku ev tenê ji bo wê têne gotin û li ser wê ne.

– Hûn baş dizanin dema ku zarok direve ez çiqasî xemgîn dibim. Zarok hemû li xwe vegeriya-

bûn û bi baldarî li Moayê temaşe kiribûn.

– Trafîk gelekî talûke ye. Çênabe kesek derbasî wî aliyê baxçeyê dibistanê bibe. Bifikirin ku tiştek biqewime.... Tije erebeyên ku bi lez diajon e... Ku mirov haj ji xwe neke.

Û wekî din jî mamosteyê behsa ku ew bibin hevalên hev yên baş kiribû.

Li vegera malê, di otobosa dibistanê de, Pelle li dawiyê rûniştibû. Moa, ew li pêşî rûniştibû û qoltixa kêleka wê vala bû.

Hîna li sifderê bêhn hatibû Pelle. Vanîlî û pasteşekir û xweşetam. Dayê bi patinê daketiye, ew fikirî. Kêliyekê wan bêhnên xweş ew dabûn fikirandin. Dayika wî ji wan kesan bû ku ew bi peydakirina tiştên nû mirov şaş dikin û behetî dihêlin. Û ger ev bêhna pasteyê be, wê demê Moa û dayika wê ya bi navê Birgit li vir in. Ew niha naxwaze Moayê bibîne. Lê, pê re jî Pelle fikirîbû. Birgitê niha piyê xwe şikenandiye. Ew nikare wisa dûr û dirêj here. Ev baş e!

Dayê bi xemilandina pasteyê daketiye. Wisa xuya dike ku ew ê pirr bedew bibe. Niha hemû çîlek û bilalûk û tûreşkên di nava ava cemedî ya qûşxaneyê de bûn. Û ev bi rastî pir xweşbû. Ew sosa vanila ya bitam ku hîna niha dayê di nava wê qeymaxa spî ya nepişî de dakiribû.

– Berî herkesî ez ê jê bialêsim, Pelle got.

– Ew zarokên qerase yên mîna te ku diçin dibistana serete êdî nema qûşxanan dialêsin, dayê gotibû. Lê Pelle dîtibû ku ew tenê henekan dike.

– Roja te çawa derbas bû? Behs bike!

Pelle li ser tiştên qewimîne fikirîbû. Ger ew bibêje: "Ez îro bi Torbjörn re bûm", wê dayê hema pê re bibêje:"lê Moa, ew diviya bi te re bûya?"

Û ger ew behs bike ku Moa ji dibistanê reviyaye, yan jî ku zarok di otobusê de bi wan keniyane, wê dayê roja wî biherimîne. Carinan, Pelle fikirî, carinan zehmet e ku ew dayê wek dayik bibîne.

Paste hate qetkirin. Pasteyên dayê gelekî mezin



û nepişî û bedew bûn. Dema Birgîtê, dayika Moayê, pasteyek dipat, ew gelekî xweşiktir dibû. Wê li ser pasteyên xwe ji toyê xelekên xwar î biçûk û ji rêçalê jî, fitîlên rast û yên xelekî çêdikirin.

Û pasteyên dayê bi rastî jî gelekî xweş in. Wî diviyabû ev qebûl bikira.

– De, ka bêje niha! dayê got. Tu divê pirtûkên xwe yên nû şanî min bidî.

Pelle hinekî din xwe aciz hîs kiribû.

"Bêje!" " Niha behs bike" Mirov nikare tiştekî tenê jî ji xwe re bihêle, ew fikirîbû. Qet ji dilê wî nedihat ku ew behsa roja xwe bike.

Niha paste qediyabû. Ew gelekî bilind bû. Bi çîlek û qeymaxa xwe ya sipî wisa nepişî bû. Wan xelek û girikan mîna bircekê paste hildigirtin.

– Ez karim qetîtekê bigrim? Pelle got.

– Ne niha, dayê got. Em ê niha vê bi xwe re bibin û em ê herin cem mala Kalsson. Dayika Moayê nikare xwe bi wî nigê xwe bigihîne vir. Me li hevdû kiriye, ku em şevbuhurka xwe li wir bikin.

– Ez nayêm wir, Pelle got û li wê pasteyê temaşe kir.

– Gelo ez karim niha para xwe bigrim? wî got

– Hoho, bi dengekî mîna yê werdekê dayê gotibû. Tu ê bibînî. Ger tu bi me re neyî şevbuhurkê, tu ê pasteyê bi çavên serê xwe jî nebînî, wê berdewam kiribû.

– Waa, Pelle madedayî gotibû. Wê demê ez jî naxwazim. Wî hîs kiribû bê acizî û nexweşî çawa

li nava wî belav bûbû. Çilika wî li ser pasteyê diçû. Xweska wî paste nedîtibûya. Lê niha. Û çûyina cem mala Moa. Tucarî. Wî çenteyê xwe yê nû heliqandibû koşeyeke medbexê. Li wir li pişt balîfî psîk razay bû. Pisîk bi tirs xwe avêtibû erdê û mîna fîşekekê ketibû binê yanê û Pelle ew çavên pisîkê yên ji tirsan beloq bûbûn, dîtibû.

– Ev çima pisîka me wisa tirsonek e?Pelle pirsîbû.

– Li vê dunyayê pir rehet mirov dikare biêşe, dayê gotibû. Pelle fêm nekiribû bê dayê dixwaze bêje çi.

Pisîk di binê çenteyê wî de nemabû û ew birîndar jî nebûbû. Pelle xwe bi hejandin û badan di deriyê medbexê re avêtibû derve. Wî baş zanîbû ku dayê sebeba vê hereketa wî mereq dike. Lê wê tiştek tenê jî ji Pelle nepirsîbû. Dayê ji tiştekî aciz bûye, ew fikirî. Wê zanîbû. Ya helî baş jî ev bû. Pir çêtir bû. Wê dizanîbû mirov çawa difikire. Ger mirov li ser şûmîtîyan jî bifikirîya. Hewce ne-

dikir mirov ji wê re hertişt gotiba. Wê di mirovan de derxist. Ew gelekî ji derewan aciz bû. Derew û nerastiya helî biçûk jî, ew gelekî aciz dikir û wê demê wê dengekî "çiiiçii" ji jêra gewriya xwe derdixist.

Di gava pêşî ku Moayê avêtibû nava medbexê de wê têderxistibû ku dayê bi hertiştî zane. Mamosteyê telefon dabû û giliyê wê kiribû. Wê ev di awirên pêşî yên dayê de dîtibû. Dayê li wê nerîbû wek ku dayê dixwest dilê xwe têxe cî bê ka Moa Moa ye. Wek ku fêrbibe bê ka vê roja pêşî ya dibistanê ew guherandiye.

Moayê dît ku dayê hinekî bi tirs e, ku behsa şaşiyên wê bike. Wê negot: " Lê Moa, ji bo xatirê Xwedê ev çi qewimî?" yan jî "Çima tu ji dibistanê reviyayî?" yan jî " Tu dixwazî bêjî çi bi..." Wê tenê temaşe kiribû.

Dawiya dawî wê gotibû:

– Mamosteyê telefon da. Ez dizanim bê te çi kiriye.

Ev ne pirs bû. Moayê ev nebersivand. Hertişt wekî ku tu dizanî ye.

Moayê li wê devera ku dayika wê tevlî alçiyên xwe lê rûniştî bû temaşe kiribû. Moayê baş fêm kiribû ku wê dayika xwe aciz kiriye û ew divê ji ber vê kirina xwe fedî bike. Û dîsa jî Moa fikirî ku ew bibêje:" Min tiştek nekiriye. Dê di demeke kin de baş bibe. Xwe aciz neke." Wê dixwest bigota, wê dixwest ew wê giranî û birîna di nava sînga xwe de hinekî sivik bike. Niha Moa gelekî xemgîn bû hem ji bo xwe û hem ji bo dayika xwe. Moayê baş zanîbû ku ji ber hinek sebeban dayê mîna wê bi tirs e. Ew ditirsiya ku wê Moa bikêrî dibistanê neyê. Ne bikêrî dibistanê û ne jî bikêrî tiştekî din.

– Niha wê mêvan bên, dayê got. Dê Pelle û dayika xwe werin. Em ê roja pêşî ya dibistanê pîroz bikin.

Moa fikirî bê çiqas rehet mirov dikare dîn bibe. Pîrozkirina roja pêşî ya dibistanê di rewşekê de

ku ew ji ber xwe şerm dike.

Moayê rahişte çenteyê xwe yê sor yê dibistanê û hêdîka berê xwe dabû odeya xwe. Wê dixwest ku dayê ji wê re gotiba: "Ka ez li pirtûkên te yên nû binerim." Lê wê tiştek negotibû. Ew fikirî bû, bê çiqasî dayê şa bûbû dema ku wê cara pêşî ferq kiribû ku Moa dikare bixwîne. Moa dikare bixwîne. Wê demê dayê fikirîbû ku Moa êdî dikare bikêrî dibistanê were. Mala wan wê demê li Storbynê bû, û tenê Moa pênc salî bû. Moayê li hemû lewheyan nerîbû û gotibû:" Dayê ev berber çi ye?" Û wê wiha gotibû ku peyv bûbû beeerber. Û dayê gotibû: " Beeerber ne tiştek e." Lê Moayê lewheyek destnîşan kiribû û gotibû:" Li vir dinivîsîne beeerber."

Dayê ji wê re gotibû ku ev berbeeer e, û behs kiribû bê ew çi karî dikin û dayê gellekî şa bûbû ku Moa dixwîne. Wê karîbû hemû lewheyên li ser firinê bixwîne û Domus û pisporê-caman û tevî ku ev gotineke pirr dirêj jî bû Moayê ev xwendibû.

Wê demê gelekî kêfa dayê hatibû û wê bawer kiribû ku ê Moa bikêrî dibistanê were, tevî ku ew fedîkoyî ye.

Moa nedixwest ku Pelle û dayika xwe werin vir. Wê nedixwest tevlî vê şahiyê bibe. Wê çawa ev ji dayika xwe re bigota?

Tam dema ku Moayê dikir derî bi dû xwe de bigire, dayê gotibû:

– Çidibe Moa.

Moa li dayika xwe zîvirîbû. Dayê wisa bêçare xuya dikir. Ew rûniştî bû û wê ew piyê xwe yê celskirî dirêjî ser kursiya pêşiya xwe kiribû. Ew darçengên (darên binçengan) ku dayê ji nexweşxaneyê deyn kiribûn, wisa ew sipartibûn maseyê. Ji aliyekê, tenê Moa dixwest here ber dayê û bi wêrekî bêje:" Sibe ê baştir be. Ew ê hertişt baş û xweş bibe. Xwe aciz neke."

Hema pê re jî wê dixwest bêje: ez naxwezin bi we re bim. Ez naxwazim tevlî şahiya we bibim. Ji ber ku ev ne ya wê bû. Moayê dixwest xwe veşê-

re. Wê nedixwest ku Pelle bê.

– Tu divê alîkariya min û raxistina maseyê bikî, dayê got.

"Naaa", wê dixwest bi qêrîn bigota. Lê li şûna vê wê got:– baş e, baş e.

Moayê derî hêdîka bi dû xwe de girtibû. Çenteyê dibistanê yê sor avêtibû ser wê çarşeva livînan ya zer. Ev a ku wê bi xwe hilbijartibû. Ew çûbû ber pencereyê û li derve meyizandibû. Wê demê wê Anna, dayika Pelle li jêra kaşik dîtibû. Û ew tenê dihat. Pelle ne bi wê re bû.

Diviyabû ez aciz bûma, lê ez şa me, Moa fikirî û wê bazda medbexê.

– Dayê, vaye dayika Pelle tê. Min ew li jêra kaşik dît. Lê Pelle ne bi wê re ye.

Û ji nişkê de wê bi kêfxweşî alîkariya dayika xwe kiribû. Ew dê ji xwe re li hêwanê rûnin, wê biryar dabû.

– Hihiii, dayê gotibû û hinekî ecêbmayî mabû.

– Û em ê wan fincanên xwe yên xweşik bînin,

Moayê dewam kiribû. Ew yên ku di qubaleyê de ne. Ew yên ku gulgulî ne.

– Birastî, dayê got.

Moa bi xar çû û ew firax anîbûn. Wê hema bêje xwêdan dabû. Wê mase pir xemilandibû û neqişandibû. Destmalkên zirav yên kaxetî. Selika nên. Mûmdankên zîvîn.

– Ev divê mirov ji sersalê re bihêle, dayê got. Lê Moayê dixwest ku ew vê niha dayne. Dayika Pelle, Anna, wê find di nîvê havînê de pêxistibû.

– Erêêê erê, dayê got û ew serbest hiştibû.

– Ez tenê têm, Anneyê got, dema di derî re dikete hundir.

– Lê ne destvala, dayê got û ew pasteya wisa xweş î mezin nîşan da. Û ew gelekî kêfxweş bûn.

Ew ê gelekî xweş bibe, Moa fikirî. Û hinekî jî dê cûda be. Ev gelekî ecêb bû ku Pelle ne bi wan re bû.

– Mêran dev ji me berdan, dayika Pelle got. Niha em keç em ê wextekî xweş bi hevdû re derbas

bikin, û dest bi çîrokan kiribû. Çîrokên li ser wê bi xwe. Wê ewqas xweş digot ku Moa û dayika xwe ji kenan zikopişto dibûn. Wek ku wê carekê deriyê otêlê li ber xwe girtibû, yan jî wek wê dema ku wê nikarîbû ew qoltixa ku wê bi xwe xistibû hundirê hesensorê deraniya derve. Yan jî wek wê cara ku wê mifta qubaleya kirêkirinê ya li navenda Stockholmê winda kiribû, û ciyê qubaleyê jî jibîra kiribû, bi wî awayî ew heta Romayê bê baxac çûbû. Gelek serboriyên dayika Pelle hebûn. Ew li gelek deveran mabû û ew tucarî tucarî netirsiyabû, Moa fikirîbû.

Ez dixwazim bibim mîna dayika Pelle, ew fikirîbû. Ku ew bicesaret e.

Hîna jî tukesî di sefê de nizanîbû ku Moa dikare bixwîne. Zarokên dibistanê ev nizanîbûn û mamoste jî nizanîbû. Dema Moa di sefê de rûniştîbû û zarokên din dikirin qerebalix, carnan diheliqî serê Moa ku ew destê xwe rake û perçeyek ji pirtûkê bixwîne. Wê hemû şaş bibin û wê mamoste

bêje; "Moa, tu dikarî bixwînî? Me ev nizanîbû."

Di dilê Moa de hebû ku jîrektiya xwe nîşan bide, lê di eynî demê de jî wê dixwest xwe veşêre û xuya neke.

Li malê dayê ji wê pirsîbû dibistan çawa derbas bûye, û wê demê Moayê gotibû:"Baş". Moayê bi xwe jî nizanîbû ka wê gevezetî kiriye yan jî rastî gotiye. Dibistan ne wisa nexweş bû mîna wê roja pêşî. Wê destpêkiribû hevalên xwe yên sefê naskiribû. Û ew çawa bûn. Tukesî elaqê xwe ji wê nedianî. Tenê carnan henekê xwe bi wê dikirin.

Yek ji kurikan navê wî Nicklas bû. Ew yekî wisa şûm bû ku timî şûmîtî dikirin. Zarokên din jî timî paşgotinaya wî dikirin. Ew bû yê ku bi pênûsa alkolê li ser maseya dibistanê nivîsandibû ku nivîs jê neçûbû. Dîsa ew bû yê ku hemû çakêt avêtibûn nava poxanê, ku hemû zarokên dibistanê li ser serê mamoste civiyabûn û qîrîyabûn:

– Dîsa Nicklas dîn bûye.

Û tevî ku mamoste bi Nicklas de xeyidîbû jî, ça-

vên wê keniyabûn. Çavin bi kêf û bêşerm li ser Nicklas bûn.

Hemû zarok, ji bilî Moa, xwedî heval bûn. Ew ji xwe re bi nêrdewankan ve hildikişiyan. Bi topê dileyistin. Bi şerîtê dileyistin. Moayê pir dixwest ew bi wan re bileyize.

Ajotina pisîklet li baxçeyê dibistanê qedexe bû. Yê ku tenê ev dikir, Nicklas bû. Wê pisîklet bi ser keçikên ku xwe di ser şerîtê re diavêtin diajot. Wan dikirin qerebalix û dikeniyan û bazdidan. Lê niha ew mecbûr bû ku dev ji ajotinê berde, ji ber ku xidame dihat. Ew yê ku navê wî Bettet bû, lê Börje jî dihate gotin ji wî re. Wexta Moa roja pêşî ji dibistanê reviyabû, wî Moa girtibû û anîbû dibistanê. Moa piştî wê rojê qet bi wî re nepeyivîbû. Û careke din jî hewce nekiribû ku ew jî here derve û li Moayê bigere.

– Tu nikarî min bigrî, tu nikarî min bigrî, Camilla qîriyabû û di ber Nicklasê ku berdabû pey wê re bazdabû.



Niha leyistika maçîkirinê ê dest pê bike, Moa fikirî bû. Birastî jî wisa bûbû. Hemû kurikên din jî bi bazdan hatibûn û nêçîrê dest pê kiribû. Moayê zanîbû ku keçik jî hej ji leyistika maçîkirinê dikin. Tevî ku wan digot:

– Wîîîî, ev kurik çiqasî dînik in, lê di çavên wan

de jî dilxweşî xuya dikir.

Leyistika maçikirinê, ew bû ku dema kurikan berdida pey keçikekê û ew maçî dikirin. Bi taybetî kurikan dixwestin Camillayê maçî bikin. Tim û dayîm birek kurik li dora wê bûn.

Tukesî guh nedida Moayê. Pelle jî bi yên ku bi leyistika maçîkirinê dileyistin re bû. Ew jî bi dû Camillayê de bazdida. Dema ku Moayê didît ku Pelle jî di nava birrê de ye ew gelekî diêşiya.

Navberdayinên dibistanê talûkene hîn jî, Moa difikirî. Ew timî bi tena serê xwe dima. Pelle timî bi Tornbjörn re bû. Ew yê ku gotina wî helî zêde li sefê derbas dibû. Ew serok bû. Ew Tornbjorn bû yê ku dikaribû di navberan de caman veke û kaxizan belav bike û texteyê paqij bike (jêbibê). Camilla jî serok bû. Tornbjörn û Camilla bûn yên helî girîng, piştî mamoste û xidame, Moa fikirî.

Û Pelle hevaltî bi Tornbjörn re dikir. Lê niha wî berdida pey Camilla di leyistika ramûsanê de.

Moa li baxçeyê dibistanê tenê mabû. Nicklas

hetibû ber wê û bi çavên xwe yên bêşerm li wê nerîbû û gotibû:" Tu hej ji Pelle dikî". Nicklas kurikekî wisa bû ku bêhna tiştên veşertî dikir. Wî ferq kiribû bê Moayê çawa li Pelle temaşe kiribû. Lê gelekî kêfa Moayê hatibû ku wî bi hertiştî nizanîbû.

Ew roja havînê hate bîra wê, dema ku mezinan şahiyeke mazin li dar xistibûn. Herkes li derve li hewşê bûn û dans kiribûn. Wê û Pelle jî xwe xistibûn binê wê maseya mezin ya li salonê. Pêşî wan ji xwe re behsa tiştên ku ew ê di mezinahiya xwe de bikin, kiribûn. Ew ê li ku bimînin û ew ê çi karî bikin. Ew ê herdû jî bûbûna pîlot. Carinan ê Pelle îdare bikira û carinan jî dê Moayê birêve bibira. Û herdû ê eynî mîna hevdû bifikiriyana. Tam di wê demê de Pelle qamûşê xwe nîşanî wê dabû. Lê wê demê Moa keniyabû û gotibû, ku wê hîna di dema ku ew du salî yan jî yek salî bû de dîtiye. Û herdû ewqasî keniyabûn ku qirika wan hilatîbû.



Ha berê wisa bû. Berî ku dibistan dest pê bike. Wêdema ku hîna Pelle hej wê dikir.

Wan li medbexa dibistanê meqerna û avdohk xwaribûn û ew niha li ber devê deriyê sefê rêz bûbûn. Mamoste hatibû û derî vekiribû. Wê kêlîkê mamosteyeka din hatibû û peyivîbû.

– Herin hundir û xweşik rûnin, mamosteyê goti-

bû. Ez niha têm.

Wê derî vekir û zarok ketin sefê. Moa ji nişkê de sikinîbû.

Li ser wê texteya reş î şîn bi herfên xwar wiha hatibû nivîsandin: MOA HEJ JI PELLE DIKE.

Moayê nizanîbû ew bi ku de here. Camilla dest pê kiribû qîriyabû.

– Mmmmoooa hejjjj jiiii Peeeellee diiiike, Mmmoa heejj jiii Pelle dikeeee, Moa hej ji Pelle dike.

– Moa hej ji Pelle dike, Moa hej ji Pelle dike, zarokên din jî dest pê kirin qîriyan. Pê re mamoste hatibû hindur. Mamoste hêrs bûbû. Pişt re ji wan pirsîbû.

– Ev kî ketiye sefê tevlî ku derî kilîtkirî bû? Û kê ev tişt nivîsîye? Û çima...?

Camilla çûbû ber wê texteya mezin ya şîn û hemû nivîs jêbiribû, û zarok keniyabûn:

– Nicklas e. Nicklas e.

Camillayêbi dengê xwe yê bilind gotibû .

– Birastî jî wî ev nivîsandiye. Herkes dizane.

Mamoste bi wê de jî xeyidîbû.

Di dema bêhnberdanê de wan ew gelekî aciz kiribûn. Nicklas û Camilla û Bengt û Ronny û hema hemû li Moayê hatibûn hev. Ew ketibûn pêşiya wê û bi yek dengî wan gotibû:

Kesek nikare ji vir derbas bibe, derbas bibe
Heta ew navê hezkiriyê xwe nebêje.
NAVÊ WÎ ÇI YE? PELLE!

hemû bi hev re qîrîya bûn.

Car bi car. Car bi car.

Moa di nava zarokan de mabû. Ew nikarîbû ji wir derketa. Wê dizanîbû ku Pelle û çend kurikên din li nêzîkî wan bi topê dileyizin. Ew hemû gotinan dibihîze. Moayê hîs kir ku hêsirên wê diherikin. Ev neheqî ye. Moayê tutiştek jî nekiriye. Û dîsa jî ew xerabiyan bi wê dikin. Çima wan Pelle aciz nedikirin?

Moayê tiştek ferq kiribû. Kurik gelekî qure dibin û di ber xwe re diçin dema, ew dibihîzin ku

keçik hej wan dikin. Moayê tiştekî din jî ferq kiribû. Wê nizanîbû bê ew ê çawa vê yekê zanibe, lê wê fêm kiribû ku Camilla jî evîndarê Pelle ye. Ji ber vê ye ku niha Camilla sekiniye û serkêşiya zarokan dike ku ew Moayê aciz bikin.

Kesek nikare ji vir derbas bibe, derbas bibe heta ew navê heskiriyê xwe nebêje.

NAVÊ WÎ ÇI YE? NAVÊ WÎ ÇI YE? NAVÊ WÎ ÇI YE?

Moa giriyabû, ji ber ku ew neheqî bû. Û ew giriyabû, ji ber ku kesekî bi wê re hevaltî nekiribû. Û ji ber ku Pelle dev ji wê ber dabû. Ji bo ku wî dihişt ku zarok wê biqeherînin. Moa fikirîbû: Ku niha birrek zarok li ser serê Pelle civiyabûna û ew wisa aciz bikirana û wê ev dîtibûya. Wê demê ew ê çûbûya cam wan û ji wan re bigota:

– Ev çima hûn wilo dîn in.

Dikarîbû ew ji wê jî aciz bûbûna. Lê Moayê baş zanîbû ku wê dê wiha bikira. Hevaltî ev e.

Ecêb bû dema wan didît ku keçik digirî. Niha

helî zêde ew ji bo girî digirî. Di wê demê de xidame hat. Ew ê ku navê wî Börje bû û bi navê Bettet jî dihate nas kirin. Ew rast hatibû ketibû nava koma zarokan û bi ser wan de qîriyabû:

– Îca ev çi ye? Zarokno, qey we aqilê xwe xwariye!

Wî xwe bi ser Moayê de daqul kiribû û hêdîka gotibû:

– Rojbaş, hevala biçûk. Ha ji te re tu dikarî destmalkê careke din deyn bikî.

Destmalk çargoşe î şîn bû û Moayê meraq kir, ev eynî destmala berê bû.

Dûv re wî berê xwe da zarokan ku strana-acizkirinê digotin û ji wan pirsî ka çima ew li hemberî wê wisa nebaş in. Lê hemû zarokan gotibûn:

– Em tenê henekan dikin. Ev tenê henek bûn.

Lê Bettet aciz bûbû.

– Henek, çi henek û çi hal. Ji xwe re li keçikê binerin. Ev ne tu henek in ku hûn wê bi girî vedikin.

Û wî bi destê wê girt û ew bi xwe re daxiste odeya xwe ya nêzîkî qeboyê. Ew odeya ku bêhna boyax û terepentînê jê dihat. Aletên tamîrê bi hemû dîwaran ve daliqandîbûn û mase hemû reş bûn û ser wan tije lekeyên neftê bûn. Moayê dema xwe ya mayî hemû li wir derbas kiribû.

Pelle mîna hertimî li dawiya otobosa dibistanê rûniştibû. Ew ê piştî kêliyekê bigihin Lillona ku li wir Moa û ew ê peya bibin. Ew kêlîka helî bi acizî ya seranserê rojê bû.

Pelle ji binî fêm nedikir çima wiha bû. Wî hewl da ku ew li ser tiştên ku îro li dibistanê qewimîne bifikire, lê wî di xwe re nedîtibû. Wî xwe bi xwe digot ku min zarok li wê sor nekirine. Û wî tucarî bi zarokên ku Moa aciz dikirin re hevaltî nekiriye.

Wî ji cîyê xwe aliyekî ji kumê sor yê Moayê dîtibû. Timî cîyê li kêleka wê vala bû.

Ew ê piştî kêliyekê bigihin cîyê peyabûnê. Ew dema ku Pelle helî zûde jê ditirsiya. Ew ê bi dû

hevdû bêdeng de herin. Ew ê yek ji wan tenê gotinekê jî neke û wek ku di navbera wan de çaleke mezin hebe. Carina Pelle difikirî ku ew ji otobosê peya nebe û ew here heta cîyê ku Svenne û Gert lê dimînin. Ew ê ji wir hêdî hêdî ji xwe re ber bi malê de bimeşe, tenê ji bo ku ew ji çûyina bêdeng ya di pey Moayê de rizgar bibe.

Ger ez ji wê re bibêjim:" Em li hevdû bên." Lê ev qet nabe, Pelle fikirî. Jixwe ji ber ku ew li hevdû bûn û Moayê ev nîşan dabû, evqase tişt hetibûn serê wan. Li dibistanê kurik bi kurikan re ne û keçik jî bi keçikan re ne. Wî ev yek bi awayekî vekirî ditibû. Ew nikare vê edetê xera bike. Û ku ew Moayê biparêze ê rewş baştir nebe. Wê demê ê zarok pişta xwe bidin wî jî.

Lê Pelle di kûrahiya dilê xwe de jî hîs dikir ku ew tiştine şaş dike. Wî dihişt ku zarok henekên xwe pê bikin. Ev mîna lekeyeke nexweş di nava sînga wî de bû. Û vê êşê dikir, ku ew ji Moayê hêrs bibe. Ji ber ku ew xwedî wijdaneke xerab

bû. Lê ji ber ku Moa bi dibistanê re lihevdû nedikir, wî nikarîbû xwe aciz bikira, wî xwe parastibû. Wî nikarîbû tiştek jî ji bo vê bikira.

Moa eynî mîna wê pisîka malê ye, Pelle fikirî. Ew jî bikêrî tiştekî nayê. Ew pisîka ku newêre derkeve derve. Ew roja havînê ya germ hate bîra Pelle. Kêfa wî ji pisîkê re hatibû, û ew fikirîbû ku divê pisîk derkeve derve û hinekî hilma xweş ya rojê bistîne. Wî hêdîka pisîk danîbû ser wî geyayê devê derî. Û pisîk cefilîbû. Wê xwe pirnisandibû û ji wî dengê ku bayê bi qirşûqalan xistibû qutifîbû. Ew wisa mexel ketibû û ricifîbû. Pelle mecbûr mabû ew biribû hundir dîsa.

Ji wê bi şûn de xelkên dihatin serdanê, hemû bi pisîkê dikeniyan. Tevî ku ew li gund diman jî, wan qutiyek tije zixur kiribûn, ji bo ku pisîk newêrîbû derkeve derve mîz bike.

Niha otobus sekinîbû û herdû zarok peya bûbûn. Dema ku ew wisa bi dû hevdû de bêdeng diçûn Pelle fikirîbû: yê ku mîna pisîkê ye, ez im. Yê

ku ditirse jî ez im. Ez newêrim carekê tenê jî rahêjim destê Moayê.



Medbex vala bû. Tenê pisîka ku xwe xistibû binê yan li malê bû, dema Pelle hatibû.

Pisîka-bizdo, fikirîbû Pelle û ber bi hundir ve qêriyabû;

– Rojbaş dayê, tu li mal î?

Lê kesî bersiv nedabû.

Dibe ku ew li axur be, yan jî li daristanê ye, yan jî li cem mala Karlsson e, ew fikirîbû. Dibe ku ew li kar jî be. Mirov bi karê dayê tucarî nizanîbû. Ew dikarîbû li nexweşxaneyê bûya jî, ji ber ku ew hemşîre bû. Ji ber vê yekê jî piraniya caran ew bi şevan jî dixebitî. Lê carinan diqewimî wê karê xwe bi hinekan re diguherî. Tevî ku roj jî bû, ew ne li mal bû.

Ger ev berî bi çend hefteyan bûya, berî destpêkirina dibistanê bûya, wê Pelle kêliyekê jî nefikiriya ku dayê çima ne li mal e. Hema ew ê rast çûba cem mala Moayê, û Birgit, dayika Moayê, dê paste û çoqulat danîbûna ber wî wek ku ew li malê be. Lê niha cûda ye. Ew niha nema bi Moayê re digere û ew nema diçe mala wan jî. Ew ji wê roja berî destpêka dibistanê ve neçûye wir.

Pelle fêr nebûbû ku tenê li malê bimîne. Mal wek ku vala be. Bavo li daristanê bû. Yabo terektor û mekîneyên mezin yê şîrketê diajotin, û hîna gelek seat hebûn, ji hatina wî re.

Pelle tiştekî ku bike peyda nekiribû. Ew Moa bû ya ku gelek leyistik peyda dikirin.

Pelle zanîbû ku dayê û bavê meraq dikin. Herwiha Birgit û Hugo, dê û bavên Moa jî meraq dikin. Dayê kiribû ku bi wî re bipeyive: " Çi qewimî ye? Çima tu û Moa bi hevdû re naleyizin?" Lê Pelle tenê devê xwe biribû û anîbû. Wî bihîstibû dema ku Birgit li vir bû, çawa dayê û wê dixwestin zanibin bê çi qewimiye. Lê Pelle bi xwe jî baş nizanîbû. Tenê ew û Moa êdî nema mîna berê heval bûn. Li dibistanê, keçik bi keçikan re, kurik bi kurikan re digeriyan. Lê şaşî di wir de bû ku Moa bê heval mabû. Lê ma wê Pelle çi bikira. Ew seranserî rojê ji ber vê rewşê aciz bûbû.

Pelle xwe daqûl kiribû û li pisîka di binê yan de bû, nerîbû. Pisîka ku nedixwest ji wir derkeve. Ew di binê yan de mexel ketibû û xwe bi dîwar ve kiribû dirdirk.

Ew birastî jî ecêb e, Pelle fikirî. Mirov vê di çavên wê de dibîne. Tirsonek û nerehet e. Nîvê dev-

rûyê wê pembe û nîvê din reş bû. Û tam li ser nîvê jora çavek wê çermekî spî hebû. Birastî jî ew dişibe palyacoyan(qeşmeran), Pelle fikirîbû.

– Pisîka dînik. Derkeve, Pelle got. Lê pisîkê xwe neleqandibû.

Pisîkeke dînikî heye li cem me, Pelle biacizî fikirîbû. Lê li cem mala Moayê çêlikeke pir şêrîn ya pisîkan heye, her wiha du se jî hene, Benny û Lenny. Du taxarên (cinsek ji seyên çîmkin yên almana ye) pir şêrin ku bi mirov re dileyizin û henekan dikin jî, hene.


Dayê hema çi tîne malê hemû mîna vê pisîkê ne. Berî zivistanê ew dîsa bi seyekî nexweş hatibû malê. Seyekî kulek. Ew se ji ber xwe ve miribû. Mirov nikarîbû bi wê re henekan jî bikira. Û mirîşk, mirîşkên wan jî hebûn. Lê mirov nikare bi mirîşkan re bileyize, Pelle bi acizî fikirîbû. Yan jî bi çêlekan re.

– Were vir, pisîka tirsonek ya dîn! bi ser pisîkê de qiriyabû. Piştî vê qîrînê pisîkê hîn bêtir xwe bi

erdê ve ziliqandibû. Wê bi çavên xwe yên zerekesk hîn bêtir bi tirs û xof nerîbû. Pelle fikirîbû: Ez ê niha te ji wir derînim.

Wî, ji dolaba ku firaxên paqijkirinê têde bûn, rahiştibû destikdarê firçê yê dirêj. Û ew di zikê pisîkê de rakiribû. Pisîka reben mîna fîşekekê pekiyabû, rast xwe li medbexê girtibû û ji wir jî ketibû pişta dolaba porselen. Nêçîrê wiha dest pê kiribû. Pisîk pir tirsiyabû û hema ji pişt wir jî derketibû û çûbû odeya rûniştinê û Pelle jî bi dû wê de. Wî di pişt yan, dolabê, gardolabê û sandoqê de cî li pisîkê teng kiribû. Pelle bi dardestikê firçeyê hemû deverên ku pisîkê dikir xwe lê veşêre xiş dikir.

Heta ku ji pisîkê hatibû xwe hilavêtibû û hilkişiyabû ser dolaba pirtûkan û ji wir bi çavên silbûyî li dora xwe meyizandibû. Hema di wê demê de dayê dabû derî. Dayê di nîvê deriyê nîvcî de sekinîbû û behetmayî li pisîka ku hilkişiyabû ser dolaba pirtûkan û Pelle yê ku darê firçeyê di destê wî de bû, temaşe kiribû.



– Îca ev çi ye, wê gotibû.

Pelle bi xar dar ji destê xwe avêtibû û xwestibû ji wir here, lê dayê ketibû pêşiya wî. Dayê hema hişk bi çepilê wî girtibû û gotibû:

– Ez dixwazim zanibim bê ev çi ye? Ji bo xatirê Xwedê ev tu çi ji vê pisîka reben dixwazî?

Lê Pelle bersiv nedabû. Wî pir fedî kiribû. Ne ji ber ku wî wisa li pisîkê kiribû, ji ber ku dayê bi ser wî de hatibû.

– Niha ez û tu em ê rûnin û bipeyivin, dayê bi awayekî bi biryar gotibû, lê Pelle got:

– Tiştekî ku em li ser bipeyivin tuneye. Hîç jî tuneye.

– Baş e, dayê gotibû û ew berdabû. Ger tu naxwazî bê ev çi ye tu dikî, wê demê ez jî zorê li te nakim.

Dayê li xwe zîvirîbû û Pelle bi dû wê de nerîbû. Çima wê nedabû ser wî. Wî hem dixwest û hem jî nedixwest ku dayê zanibe bê wî çima wisa kiriye. Di derî de dayê li xwe zîvirîbû. Pelle xwestibû bêje:"Were ez ê ji te re bêjim bê çima wisa bû." Lê dayê çûbû medbexê û ew dema ku Pelle difikirî ku ji dayê re bibêje jî derbas bûbû.

Piştî demekê dayê dîsa di derî de xuya kiribû û

gotibû:

– Mirov çawa dikare û dixwaze zirarê bide pisîkeke wisa reben. Naaa, ez vê yekê qet fêm nakim.

Pisîk li wê jora li ser dolaba pirtûkan hîna jî xwe bi dîwar ve kiribû dirdirk û hîna jî tirsiyayî xuya dikir.

Pelle nizanîbû bê ew çima li Moayê difikire.

Pelle dîtibû ku Moa li pişt salona xwarin ya dibistanê ye. Nicklas û Camilla û Roffe û Eva dîsa henekê xwe bi wê dikin. Wî wek ku ew wan nabîne kiribû. Wî rast berê xwe dabû seheya topê ku Torbjörn û Micke li wir bûn. Ji wê devera ku ev tişt dihatin serê Moayê, ji xwe tiştekî ku wî bikira jî tunebû.

Ew fikirî ku ew hema rast here cem mamosteyê û bibêje zarok tiştên nebaş dikin. Lê nebû. Dê zarok di bêhnberdana din de ji wî re bigotan:" Marê xayîn" û " tirsoneko"

Carnan Pelle meraq dikir bê ka çima Moa wisa xwe li dibistanê gêjikî dike. Moa ya ku dikarîbû

bixwenda. Çima wê xwe nîşan nedida? Wê wek wan dikir dema ew bi ser de diqêriyan, wê serê xwe bi jîrektiya xwe nediêşand. Carnan diheliqî serê wî ku rabe û bêje ku Moa gelekî jîr e. Wê dema ku zarokan henekê xwe bi wê dikirin, bi qîrîn û libolibo digotin ku ew hej Pelle dike û wê destûra wan li xwe dida, hema Pelle dikir rabe bêje;"Moa, ew dikare bixwîne. Ew vê yekê ji xwe re dihêle. Ew xwe dike qirdik."

Pelle ketibû qelê û zarokên din jî xwe amade dikirin ku şûtan bikşînîn. Berê wî tam li wî dîwarê ku Moa li ber sekinîbû û zarokan ew aciz dikirin. Wî dîtibû ku her çûbû zarok civiyabûn û hey civiyabûn.

Wî ji bîrakiribû ku ew qelê diparêze.

Micke qîriyabû;

– Çi bi te hatiye! Tu qeleparêz î, yan na?

Û Torbjörn gazî kiribû:

– Lo! Ez ê niha li topê bidim!

Lê her ku çûbû zêdetir bala Pelle çûbû ser rewşa

Moayê.

– Bisekine, wî ji Tobben re gotibû, ku wan dest pê kiribû ji wî re digotin Torbjörn. Ew li wî alî tiştek dibe.

– Ohhoo, Tobban gotibû. Tenê Moa ye. Zarok tenê wê aciz dikin.

Pelle fêm nekir bê ew çima wisa qeherî. Wî bêyî ku haya Torbjörn jî wî hebe xwe çem kiribû wî û ew avêtibû erdê. Torbjörn şaş mabû.

– Ev çi bi te hatiye? Ev tu dîn î? qîriya Tobban. Lê Pelle li zikê wî û li çepilên wî û hama ku derê wî ketibû ber lêdabû. Heta ji wî hatibû wî kulm li wî dabûn. ”Tenê Moa” bi xezeb ew fikirîbû. ”Tenê ew Moa ye ya ku tê acizkirin û qeherandin, ha.” Moa ya ku ew ji wê hez dike. Çima wisa hemû li dijî wî ne.

Lê Tobban ji wî bi hêztir bû. Wî zû Pelle serpişt avêtibû erdê û bi destên wî girtibûn.

– Ev tu çima wisa dikî, min tiştekî xerab bi te nekiriye, wî gotibû.

– Min berde! Min berde! Pelle qîriya.

Tobban dîtibû ku hêsirên Pelle bi ser hinarkên wî de dibarin û ev ne leyistik e. Wî ew berdabû.

Niha Pelle zanîbû bê ew ê çi bike. Ew ê ji min jî aciz bibin, ew fikirî. Ew ê nema karibin Moayê aciz bikin. Ew rast çûbû nava koma zarokan. Tobban û Micke hêdîka bi dû wî de hatibûn. Mirov dikarîbû bidîta ku ew difikirin: " ewê niha tiştin biqewimin."

Moa hatina wan dîtibû. Pelle li pêşî bû. Acizî û qehreke ecêb di nava wê de hebû. Ji ber ku Pelle destûr dida ku zarok wilo li wê bikin. Gelo ew ê niha were û alîkariya wê bike. "Xwedayo tu bibînî" wê di nava xwe de gotibû. Wê tenê ev dua zanîbû.

– Qebûl bike, tu dixwazî ku Pelle te maçî bike, Camilla bi dengekî zirav î tûj gotibû.

Moa tiştek jî negotibû.

– Pelle û Moa, Pelle û Moa! zarok hemû qîriyabûn. Û Nicklas rast çûbû ber wî û bi dengekî zelal

gotibû:

– Bêje zû! Bêje zû, hûn ê çi bikin!

Niha Pelle geheştibû cem wan. Moayê çavên xwe girtibûn û xwestibû ew bimire.

Dema zarokan dîtibû ku Pelle tê, ew bêdeng bûbûn. Zarokan rûyê Pelle yê tirş û tal û qermiçî dîtibûn, hema hemûyan xwe ji ser riya wî dabûn alî. Hemûyan ecêbmayî û tirsiyayî temaşe kiribûn. Wan nizanîbûn bê wê Pelle çi bike. Wî bi awirên tûj li Nicklas û Camilla û Roffê ku xwe gavekê paş de dabûn meyzandibûn. Ew fikirîbûn ku niha wê Pelle xwe çem bike wan û bi wan re şer bike. Lê wî xwe rast li Moa ya ku li wir çavgirtî sekinîbû, girtibû.

– Were Moa. Were bi min re.

Moa çavên xwe vekiribûn. Lêvên Pelle biçûk bûbûn, eynî mîna dema ku ew aciz dibû. Lê ew ne ji Moayê aciz bûbû. Wî bi destên wê girtibûn û zarokan jî xwe dabûn alî. Dest di dest de ew ji nava koma zarokan derketibûn. Kesekî tiştek nego-

tibû. Nicklas devê xwe jî venekiribû.

Pelle, Moa bi xwe re biribû cem seheya futbollê. Tobban û Micke yên ku bi berdewam bi wî re bûn bi ecêbmayî li wî temaşe dikirin.



Wî ji wan re gotibû:

– Moa dê bi me re be. Di dunyayê de tu kes nikare mîna wê li topê bide. Em li malê dileyizin. Ha ji we re top! Lê bidin!

Dotira rojê Moa û Pelle li kêleka rê sekinîbûn û li benda otobosê bûn. Destê wan di destên hevdû de bûn, eynî mîna roja pêşî. Pelle hişk bi destê Moa girtibû. Wî pir meraq dikir ka dê Axel, ew yê ku otobos diajot çi bêje. Û wî bersiva xwe amade kiribû: " Tu li karê xwe binere.", ger Axelê şofêr di derbarê hezkirin û tiştên wisa de gotinên beredeyî bikira. Lê ew ê newêribe. Ew ê bêje:" Ev bi serê te neketiye" yan jî "te eleqeder nake?"

Niha otobus hatibû. Mezin û şîn tevî lewheya zarokan.

Pelle li doh fikirîbû. Wê roja berê. Berî ku ew nema bi hevdû re bipeyivin. Berî ku Pelle dev ji wê berde. Berî ku Moa wisa tenê li dibistanê bimîne. Li wê dera ku destê Moayê di destê Pelle de bû, wî xwe ji binî ecêb hîs kiribû. Ew heyecan û teswasa di dilê wî de çûbû.

Niha otobos sekinîbû. Moa û Pelle lê siwar bûbûn. Lêvên Pelle biçûçik bûbûn û ew difikirî: Te-

nê ez diwêrim bersiva wî bidim. Lê îro Axel bi lez bû. Ji xwe wî ferq jî nekiribû ku Moa û Pelle bi destên hevdû jî girtine.

# Moa û Pelle

## Çîrokeke evînî

Moa û Pelle du heval in. Lê ya wan ji hevaltiyê wêdetir tiştekî din e. Di navbera wan de hezkirinek heye, lê Pelle cesaret nake ku hezkirina xwe diyar bike.

Nivîskara vê kitêbê Kerstîn Johansson i Backe zarokan û cîhana zaroktiyê baş nas dike û dike ku hem zarok û hem jî mezin xwe di kitêbên wê de bibînin. Ev çîroka evînî ya du zarokên dibistana destpêk jî serpêhatiyeke welê ye. Di vê kitêbê de zarok zaroktiya xwe dijîn, mezin jî li zaroktiya xwe vedigerin...

NÛDEM